

Pirtûka "dîroka kurdên koçber"

Gabar Çiyan

Ez, di dema xortbûnê de, salên berî 80 pê hisiyam ku Kurd li derveyî Kurdistanê, hejmarek mezin li Israîlê, komarên Soviyetê û aliyê Anatoliyê jî hene. Sedemên bicîhiştina Kurdistanê û rewşa wan ya îro ji awira parastina ziman û çanda xwe, ji min re bûbûn cihê pirsê.

Bajarê ez lê mezin bûm Nisêbînê, başûrê biçûk, yê mezin û bakurê welêt bi hev girê dide, anku li ser tixûbên hersê şaxên welêt ava bûye. Bazirganiya dewletên ereban û Turkiyê di ser Nisêbînê re, bi rêya kemyonan û barkirinê pêk tê.

Salên berî 80 î hetanî 90 î jî, hejmarek mezin ji şifêrên wan kemyonan ji aliyê Konyayê bûn. Bi rêya wan, li ser rewşa kurdên li Anatoliyê bûbûm xwedî zaniyar.

Li Nisêbînê hejmarek Kurdên Cuhû hebûn. Beşek ji wana barkir û li Israîlê bi cî bûn. Hebûna Kurdên Cuhû, anku Cuhûyên ji Kurdistanê li Israîlê bi rêya wan fêr bûbûm.

Piştî derketina derveyî welêt bû nesîb ku ez li ser herdu rehên me, Kurdên Anatoliyê û Kurdên Cuhû kûr bibim. Ew ji sedemên cewaz ji xaka welatî derketibûn. Lê îro, mîna duhî bi ziman û çanda Kurdî ve girêdayî ne. Ew jî mîna me hez ji welatê xwe dikin. Tiştên em pê dilxweş dibin, ew jî dibin, bi buyerên xemgînî re, xemgîn dibin û bi me re rondikan dibarînin.

Ji min re bû cihê kêfxweşiyê ye ku lêkolînek min li ser Kurdên Anatoliyê pêk hat. Lêkolîna min "Dîroka Sirgonkirina Kurdan" ji awira rojnamevaniya lêkolînerî ve di 1993 de xelata Mûsa Anter ya rojnamevaniyê girt. Heman lêkolîn bû pirtûk û "Dîroka Sirgonkirina Kurdan, ji bo piştgiriya rojnameya Yeni Ulke yê hate belav kirin.

2008 an de, bi hejmarek ronakbîrên Kurd û Kurdên Cuhû re hevpeyvînên min di medîa kurdî de belav bûn. Di wan de cara ewil li ser têkiliyên Kurd û Cuhûwan rêya niqaşê hate vekirin. Helbet xebatên min yê destpêkê bûn. Paşê hejmarek pirtûk ji aliyê Kurdên Anatoliyê û hejmarek nivîskarên ji Kurdistanê belav bûn û wan xebatên pir hêja pêşkêşî pirtûkxaneyê kurdî kirin.

Di vê nivîsê de ez ê hinekî ji nêz ve ji wan xebatan li "Dîroka Kurdên Koçber 1-2" ê binêrim, li ser kur bibim.

Nivîskarên herdu pirtûkan Şoreş Reşî ye. Ez gelek ji ronakbîrên Kurd yê li Anatoliyê mezin bûne nas dikim. Yek ji wan jî lêkolîner Reşî ye. Ew têra xwe zîrek e. Ez bûm şahidê xebata wî ya li ser herdu pirtûkan. Di dema amadekirina wan de, piralî dokument, pirtûk û nexşe berhev kirin. Werger û analîza wan bi mehan domand. Wî bê westan da pey şopa rehên Kurdên li Anatoliyê, gera wî dirêjî bajarên Kurdistanê û Xorasanê bû. Wî bi mirovan re axifî, wêne kişandin û ji rîsipiyên li jiyane zaniyarî berhev kir. Bi metoda "INTERVJUVA DEVKÎ" ku li cîhanê populer e, û bi rêya şahidbûn û qisekirina kesan li ser bûyerên sedsala dawî zaniyariyên pir hêja bi dest xist. Herdu pirtûkên wî, piştî xwe didin gelek çavkaniyan.

Îdîyên nû tê de hene ku, dîroka fermî ya turkan dê serûbinî hev bike. Weke nimune di destpêka avabûna Osmanîyan de, êlên cewaz li Anatoliyê bi cî bûbûn. Yek ji wan jî "Karakoyun" e. Li gorî dîroknasên turkan, Karakoyunî turknijad in. Turkan anîne wê rewşê ku nijada Karakoyunan bê niqaş turk hatiye pejirandin. Lê nivîskar Reşî ji çavkaniyekê derdikeve rê û dide pey şopa koka Karakoyunan. Paşê bi dokumentan ispat dike ku ew, ji koka "Beraniyan" tên û bi eslê xwe Kurd in...

Pirtûka yekê bi giştî li ser dîroka Kurdistanê ye û hinek şaxên wê cî dide pirsê Kurdistanê koçberbûyî. Nivîskar li ser sirgonkirina kurdan di pirtûka duwê de kur dibe. Lêkolîna wî

destpêka avabûna Imparatoriya Osmaniyan, heta dawî û hilweşandina imparatoriye hemêz dike.

Pêşiyên Kurdên li Anatoliyê, bi eşîr û bavikan derdixîne holê. Li ser adet, tore, diyalekt û ola wan radiweste. Qirkirina Kurdan ji aliyê hêzên turk û farisan ji ber sedemên cewaz dem bi dem derdixîne holê. Paşê bi giranî li ser barkirin, koçberî anjî sirgonkirina wan kur dibe. Şaxên belavbûyî yê bavik û eşîran li Anatoliyê û Xorasanê bi wêne, dokument û nexşeyan dihêne ber çavan. Dîtina bi wan re dide mirovî. Li ser man û bicîhbûna wan li welatê xerîbiyê zaniyariyên nû û balkêş dide mirovî. Weke mîsal, nivîskar qala sîstema "Derbend" ya Osmaniyan dike û di gel zaniyariya li ser sîstemê, bi axafitina qûrbanên sîstemê jî wêneyekî pir bi hêz dide xwendevanên xwe:

"Dewleta Osmanî ji bo ku Kurdên bi darê zorê dabû koçber kirin, li cihên şandî bimînin, wê demê sîstema korîcîtiyê yanê "Teşkilata Derbend" ava kir. Li cihên stratejîk qerekol ava kirin û nava wan jî, gelek caran bi leşkerên Kurdên girêdayî hikumetê tijî kir, ji bo ku Kurdên vedigerin welatê xwe re bibin asteng. Ji wana çend wiha ne: Di navbêra Riha û Bîrecîkê de Çarmelik, di navbêra Ayas û Berendî de Kurt-kulaxî, li navbêra Misis û Antakyayê de Baxras, Li Kirşehîrê Kesîk Kopri, Li Sêwasê Alaca Han û Hesên Çelebi ye.

Xalê Bavê min Heciyê Mamî Tozê (1903-1898) digot: Êla me dixwest dîsa vegere Kurdistanê, lê derbenda Kesîk kopruyê girtine û yê me nikarîbûne, bi vî awayî em parçe bûne..."

Di dawiya pirtûkê de, tevayên eşîr û bavikên hatine ajotin tê eşkerekirin. Reşî, li ser eşîr, bavikên ajotî zaniyariyên nû dide meriv. Hinek ji wan eşîran jî ev in:

Şadiyên Xorasanê, Reşî, Şêxbizî, Canbeg, Badilî, Celikan...

Di gel aliyê zaniyariyê, nirxek din heye heye ku pirtûkê giranbuha dike: Bi Kurdî hatiye nivîsîn. Zimanê wê kêşer e. Xweş e. Peyvên biyanî ji gelek aliyên ve tîr ronîkirin. Bi zimanek xurt û bilind hatiye nivîsîn. Di 330 rûpelên a-4 de qelîteya ziman herku diçe bilid dibe û kêşara wê mirov bi xwe girê dide.

Bê guman e ku, ji bo xwendinek hêsantir, bi kêşar û fêdetir pêwîst bû teknîka nivîsînê, rêzkirina tîp û nexşeyan jî pir baş plan bûba. Ji bo bi cîkirina nexşeyan, hilbijartin û cîhkirina rengên tîpan plana hatiye kirin, dikaribû pir baştir pêk bihata.

Kurt û kin, herdu pirtûk gelek rûpelên wînda yê ji dîroka Kurdistanê ronî dike. Dîroka ajotina Kurdan mijarek giring e ku dê pêşerojê jî bibe cihê niqaşên pîralî. Xebata Reşî ji gelek awiran ve dê bibe cihê niqaşê û sûdeyên pîralî bighêjîne me. Pirtûk bi Kurdiyêk xweş hatiye nivîsîn. Hilbijartina zimanê Kurdî ji bo berhemek dîrokî ji aliyê Kurdên li Sirgonê ve bi serê xwe ispatek mezin e ji bo girêdana wan bi zimanê Kurdî û xaka welatî. Her du pirtûk jî du kaniyên hêja ne û pêwîst e li ber destê mirov be.

Pir giring e ku em li dîroka xwe, ji awira dîroknasên xwe û ji paca wan temaşe bikin.

Herdu pirtûk di tebaxa 2008 an de di nav weşanên Instîtuya Kurdî li Stockholmê derketin. Hûn dikarin bi rêya kurdiskainstitutet@yahoo.se pirtûkan bixwazin.

